

Aslan, M. & Yıldız, A. (2021). Nirxandina kurteçîrokên Mela Mehmûdê Bazîdîyî yê bi navê Durru'l-Mecalisê. *Folklor û Ziman*, 2(4), 245-264.

Wergirtin/Received: 19.08.2021

Qebûlkirin/accepted: 25.10.2021

ORCID (Aslan, M.): 0000-0002-1543-3154

ORCID (Yıldız, A.): 0000-0002-8763-4182

NIRXANDINA KURTEÇÎROKÊN MELA MEHMÛDÊ BAZÎDÎYÎ YÊN BI NAVÊ DURRU'L-MECALÎSÊ

Mustafa Aslan* & Ayhan Yıldız**

Kurte

Mijara vê xebatê hin hikayetên ku Mela Mehmûdê Bazîdîyî bi kurmançî nivîsîne û bi navê Durru'l-Mecalisê di koleksiyona Jabayî da hatine binavkirin. Di vê gotarê da hem danasîna wan, hem jî ji hêla çavkanî û mijarê ve nirxandina wan hatîye kirin. Herweha derbarê jîyan û xebatên Mela Mehmûdî da li gor çavkanîyên berdest agahî hatine dayîn û nirxandin hatine kirin. Herçiqas Bazîdî, metinên farisî jî li kêleka metinên wergeranê, yê kurmançî bi cih kirîye, jî temamiya metinê xuya dibe ku wî hin ji van hikayeyan jî nav ehlê medreseyên kurmançan berhev kirine û li wir qeyd kirine. Çawa ku jî metinên Durru'l-Mecalisê ku Mela Mûsayê Hekarîyî nivîsîne û jî metelokên melayên nav gelî, yê kurmançan jî diyar dibe, ev çîrokên Bazîdî jî, bi peywendîyeka zexim digel çîrokên gelêrî têkildar in. Jixwe Bazîdî navê tu çavkanîyeka farisî nade. Ji ber ku muderisên medreseyên kurmançan qedir û qîmeteka mezin daye ziman û edebîyata farisî, bi vê lêkolînê diyar bû ku Bazîdîyî jî, metina wan hem bi farisî, hem jî bi kurmançî nivîsiye.

| 245

Peyvên sereke: Durru'l-Mecalis, kurte çîrok, hikayetên gelêrî, nirxandina berawirdî

* Doç. Dr. Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî. Mêrdîn/Tirkîye.
E-mail: mustafaaslan@artuklu.edu.tr

** Wez. Hîn. Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Beşa Ziman û Çanda Kurdî. Mêrdîn/Tirkîye;
Xwendekarê doktorayê Zanîngeha Bîngolê, Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî. Bîngol/Tirkîye.
E-mail: ayhanmeretowar21@gmail.com

**A REVIEW OF THE SHORT-STORIES NAMED DURRU'L-MECALIS OF MELA
MEHMÛDÊ BAZIDÎYÎ**

Abstract

The topic of this study is some of the short stories written by Mela Mehmûdê Bazidî in Kurdish (kurmanji dialect) are registered as Durru'l-Mecalis in the Jaba's collection. In this article, after the presentation of the stories we try to evaluate them from the view point of sources as well as topic. Also, the information about the life and work of Mela Mehmûd was given and evaluated according to the available sources. Although Bazidi has placed Persian texts alongside Kurdish translated texts, it appears from the entire text that he collected some of these stories from the people of the Kurdish madrasas and recorded them there. As can be seen from the texts of Durru'l-Mecalis written by Mela Musa Hakari and from the stories told by mollahs among people, these Bazidi stories are also closely related to folk tales. Bazidi does not even name any Persian source. Because the teachers of the Kurmanji madrasas have given importance to the Persian language and literature, in this study Bazidi also wrote the short stories in both Persian and Kurdish (Kurmanji idialect).

Keywords: Durru'l-Mecalis, short stories, folk tales, translation, comparative analysis

Destpêk

Medreseyên kurdan, ji qedîm li kêleka tekîyayên şexan û dergehên pîran û qonaxên mîran wezîfeya xwe ya ronakbîrîyê bi cih anîye. Çawa ku şex û pîran di mekanên xwe da têkoşîna bilindkirina pile û payeya edeb û exlaqî daye, muderîsên medreseyan jî di qada zanist û edebîyatê da hewl daye ku di dîwanên mîran da keşûhewayaya hunera sîyaset û edaletê zindî bikin. Mela Mehmûdê Bazîdî (1797-1867), di beşa bi sernavê “Behsa Musennifê Mewcûd ê Serfê di nêv Ekradan” ya berhema xwe *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî* da amaje bi perwerdeya zanistî ya medreseyên kurdan dike û dibêje: “Telebeyêd Kurdistanê heta Bexda, Besra û Mûsilê diçûn û digerîyan û tehsîla îliman dikirin. Mubtediyêd ekradan ji îbtîdada *Hece* û *Qur'anê* dixwînin, paşî *Mewlûda Kurmancî*, paşî *Nûbihar* û *Pendêtarê*, paşî ji şerî'etê *Îcaz*, *Mehr* û *Enwarê* dixwînin. Îcarê îbaretê *Tesrîf*, *Zurûf* û *Terkîba* Mela Yûnisê Helqetîmî dixwînin ku eve her sêna bi zimanê kurmancî ne. Paşî ji *Serfa Se'dîne* û *Se'dullah* kuçek û hinek ji *Mentiqê Husamkatê*, *Qewlê Ehmed* û *Şerha Şemsîye*, xulase bi tertîb duwazdeh îlûman dixwînin, muntehî û mezûn dibin.” (Bazîdî, 2010, r. 56). Mela Mehmûd bixwe jî yek ji telebeyên van medreseyên kurdan e ku çavnasê dinyayê bûye, di biwara ronakbîrîya kurdan da peyrewê şopa Xaniyî ye.

| 247

Mela Mehmûd jî di nav keşûhewayaya medrese û mîrektîyên kurdan da gihîştîye pile û payeya herî bilind û di nav xuyanîyên kurd û osmanîyan da giraniyeka mezin bi dest xistîye. Piştî ku rojhilatnasê rûs Aleksandre Jaba nas kirîye, wî gelek berhemên klasîk ên kurmancî ji nav ehlê medreseyên kurdan berhev kirine, ew li hev bi keys kirine, gotar li ser wan nivîsîne, bi xeta destê xwe nusxe ji ber wan îstînsax kirine û ji bo ku ew jî mîna nîrx û dîroka xanedan û malmezinên kurdan wenda nebin, radestî Jabayî kirine. Tevî van, çawa ku wî berhemên xwemalî yên kurdan berhev kirine, wî bi xwe jî berhemên li ser ferheng û rêzimana kurmancî nivîsîne. Ew bi vê jî nesekinîye, wî ji ziman û edebîyata farisî û tirkî jî berhem li kurmancî wergêrane û radestî Jabayî kirine. Yek ji van xebat û keda wî, ev çîrokên sîyaset û hikmetê ne ku qedir û qîmeta wan ji hêla “ziman”ê dîrokî yê kurmancî ve gelek giring e.

Di vê gotarê da piştî danasîna destxetî ya çîrokan, alîyê wan ê çavkanî û mijarê hatîye nirxandin û bi çîrokên gelêrî yên edebîyata dinyayê, bi çîrokên farisî û tirkî ra berawirdîya wan hatîye kirin. Bi vî awayî me hewl daye em balê bikişînin ser karaktera anonîm ya van çîrokan, herçiqas ji alîyê Mela Mehmûdî ve ew wekî çîrokên farisî hatine binavkirin.

1. Mela Mehmûdê Bazîdî

Mixabin, derbareyê jîyan û kesayeta Mela Mehmûd, hilberê vî karê berfireh, zêde agahî tune ne. Mînak di 13 gotar, pêşgotin û pirtûkan¹ da behsa Mela Mehmûdî hatîye kirin, lê çavkanîya van xebatan tevan ew name ye ku Aleksandre Jabayî di sala 1857an da ji Peter Lerch ra şandîye. Di vê nameyê da Jabayî bi kurtasî behsa jîyan û serborîya Mela Mehmûd kirîye². Lerch di pêşgotina ku ji bo berhema Aleksandre Jabayî ya bi navê *Recueil da notices et récits kurdes*³ nivîsîye da cih daye vê nameyê. Di pêşgotinê da Lerch Mela Mehmûd wekî “hevkar û rêberê Aleksandre Jabayî” bi nav dike. Di nameya navborî da Mela Mehmûd weha hatîye nasandin:

“Mahmûd Efendî Bayazîdî, bi eslê xwe kurd e, li Bayazîd ji dayîk bûye, 60 salî ye lê pir extîyar (navsere) e. Pêşî li bajarê ku ji dayîk bûye xwendîye piştî çûye Tebrîzê. Di zaroktîya xwe da hînî xwendina Qur’anê bûye û xwe daye xwendina edebîyata zimanê erebî, farisî û tirkî ku bi şeweyekî mukemel dizane. Piştî gera Pers û Kurdistanê, ew vegeîya bajarê xwe û li wir bûye serokê xwendengehekê û piştî demeka kurt di nav welatîyên xwe da deng daye. Lê piştî têkçûna Behlûl Paşa, desthelatdarê kurd ê dawî yê li Bayazîdê, [Mela] koçî Erzerûmê dike. Demildest piştî hatina xwe dest bi pîşeya xocetîyê dike û di nav alimên welêt da dibe xwedî rêzgirtineka pir bilind.” (Lerch, 1860, r. VIII-IX).

Di berdewamîya nameyê da Jaba dibêje ku: “Sala 1846an di navbera Bedîrxan Beg, mîrê Cîzîrê û Deryê Bala da Mela Mahmûd qasidîyeka serkeftî kirîye.” Nameya Jabayî weha berdewam dike:

“Salek piştra li ser emrê Kamil Paşa, walîyê Erzeromê, Mela Mahmûd çûye nik Nûrulah Beg, serokê kurdên Hekarî ku serî li dijberî desthelatdarîya osmanî rakiribû. Careka din bi awayekî serkeftî Mela Mahmûd qasidîya xwe bi cih diîne. Piştî li ser sozên ku jê ra hatibûn dayîn birayê Bedîrxan, Xan Mahmûd, dihê Erziromê. (...) Mela Mahmûd wekî hogir û sekreterê Xan Mahmûd dihê tayînkirin. Lê pir naçe Xan Mahmûd jî serî hildide û ji ber vê, desthilatdarîya osmanî feqîrê Mela Mahmûd diavêje zindanê û encex piştî 15 rojan ji zindanê dihê berdan. Piştî van rûdanan

1 Ji bo van çavkanîyan bnr. Pêvek I

2 Dibe ku di hin arşivan da agahiyên berfirehtir derbarê Mela Mahmûd da hebin, lê li gor çavkanîyên berdest ji xeynî van agahiyên di nameyê da, ne di arşiva destxetan da û ne li cihêkî din Jaba behsa Mela Mahmud û karê wî nakê, nekirîye.

3 Zîya Avcî tîpguhêzîya latînî ya vê berhemê kirîye û di sala 2010an da bi navê Camîeya Risaleyana û Hikaytan bi Zimanê Kurmancî, di nav weşanên Weşanxaneyê Lisê çap kirîye.

sergêjîyan pêşîya Mela Mahmûd berneda, lê wekî derwêşekî xwe li hember tevan ragirt. (...) Di şerê dawî yê rûs û osmanîyan da birayê Mela Mahmûd ku piştgirê wî bû dihê kuştin; di heman demê da karê lawê wî ku li Bayazîdê bazirganî dikir têk diçe. Feqîrê Mahmûd nema karîbû debara xwe bike û karê çûna Kurdistanê dikir, lê hatina min a Erziromê, hişt ku ew biryara xwe biguhêre. Ji 1856an ve ji bo kurdî ew hevkar û xoceyê min e.” (Lerch, hb., r. IX-X).

1.1. Şexsîyeta Bazîdîyî ya Îlmî

Bazîdî, di keşûhewaya gur û germ a medreseyên kurdan da gihîştîye. Ew jî li ser rêç û şopa Ehmedê Xanî (1650-1706) meşîyaye. Bazîdîyî medrese vekirîye, muderisî kirîye û telebe gihandine. Çawa ku Celalî (2016, r. 7) jî amaje pê dike wî digel tirkîya osmanî bi zimanê erebî û farisî jî zanîye û ji berhemên zanistî yên bi van zimanan mifa wergirtîye. Wergêrana wî ya *Şerefnameyê* û telîfa wî ya bi navê *Tewarîxî Cedîdê Kurdistan* nîşane û ‘elametê vê alimî û zanatîya wî ne. Mela Mehmûd di qada îlmê dîrokê da xwedî tecrubeyeka wisa mezin bûye ku karîye kitêbeka bi qasî hezar (1000) rûpelî li ser dîroka Kurdistanê binivîse. Ev telîfa wî wisa zêde hêja bûye ku Aleksandre Jabayî xwestîye wergêre zimanê fransîzî (Bazîdî, r. 15).

Meriv dikare xebata wî ya bi navê *Adat û Rusûmatnameyê Tewayîfê Ekradiye*, wekî lêkolîneka qadî ya etnografîk qebûl bike. Xebata wî ya bi navê *Şair û Musennifên Kurdistanê* bi qewareya xwe mîna gotareka antolojîk a zanistî ye ku ji bo antolojîya edebîyata kurmancî çavkanîyeka pêewle ye.

Bazîdî çawa ku di warê dîrok û jîyana civakî-komelgehî ya gelê kurd da şareza ye, di warê zimannasîya kurdî da jî zana ye. Wî bi xebata xwe ya *Tuhfetü'l-Xîlan fî Zimanê Kurdan* ev peyîstandîye. Wî çawa bi awayekî pisporî term û têgihên rêzimanîya kurdî nikirandine, mijarên zimannasîya kurdî (Bilbil & Oztirk, 2019, r. 42) jî dane ber xwe û hîna ji wê hingê ve li ser wan kûr bûye. Bi tevî zimannasîyê li ser ferhengê jî xebitîye û ferhenga kurdî-rûsî-fransîzî; fransîzî-rûsî-kurdî amade kirîye ku tê da 15 000 bêje hene (Öztürk, 2017, r. 22).

Meqaleya wî ya li ser Teremaxîyî ku ji bo *Tesrîfa Kurmancî* wekî “Pêşgotin”ekê nivîsîye (Dost, 2010, r. 15), di reng û rûyê “bîyografî”yeka zanistî da ye. Wî bi berhema xwe ya bi navê *“Adat û Rusûmatnameê Tewayîfê Ekradiye”yê* çavkanîyeka mezin a civaknasîya kurdî ji bo lêkolerên “sosyolojî”yê (Celalî, 2016, r. 10) dîyarî hiştîye.

Bazîdî, ronakbîr bajarî ye. Di nav giregirên dewletê û xanedanên kurdan da mezin bûye. Ew ji berê ve digel mîr, hukumdar û paşayên kurdan rabûye û rûniştîye û bûye mixetabê walî, padîşah û sultanên osmanî. Di doz û pevçûnên wan da wekî alimekî aşîxwaz navbenkarî kirîye (Bazîdî, br. 13). Di zemanê wî da Herba Osmanî û Rûsan qewimîye û bajarê wî yê hukumdarîya kurdan ê Bazîdê ji bin desthilatdarîya osmanîyan derketîye; ketîye bin serwerîya artêşa rûsan. Ji lew ra meriv dikare wî wekî şahidekî giring ê dîroka wan bihesibîne. Di zemanê wî da mîr û xanedanên kurdan di keleh, qesir û qonaxên xwe da li ser karê hukumdarîyê bûn. Bazîdî di nav wê keşûhewayê da li mîrgeh û wan bajarên navendî gerîyaye. Wî qedir û qîmeteka mezin a bi qasî şeyxulîslamekî li van navendên giring dîtîye. Her ji ber çî be jî ew çûye payîtexta dewleta osmanî Stenbolê. Bi ser van giştan ra ew derketîye derveyî sînorên welatê kurdan û dewleta osmanî, ew çûye heta bajarên bijarte yên çand û zanistê, bajarên mîna Tewrîz, Şam û Qudusê jî (Celalî, hb. r. 8). Bi vê rewşa xwe ew bûye zatekî dinyadîfî.

Gava meriv bi giştî li mewqîfa Mela Mehmûd a sedsala 19an dinihêre dibîne ku li esmanê ronakbîrîya kurdan geştirîn stêrk ew e ku şû'leya îlimê dide. Herçiqaq mercên wî yên keşûhewayê îlmî ji ber liv û tevgerên sîyasî gelek xerab be jî, dîsa wî karîye di kar û barên îlmî da bi berdewamî bixebite û bi qasî zanînen ansîklopedîyekê agahî derbasî nivîsê bike.

1.2. Şexsîyeta Wî ya Edebî

Bazîdîyî çawa ku berê edebîyata kurmancî ya klasîk ji “nezm”ê zivirandîye ser “pexşan”ê, di warê “edebîyata gel a devkî” da jî çexereka din vekirîye û gelek berhemên edebîyata devkî ya kurmancî ji nav gel “berhev” kirine û derbasî “nivîs”ê kirine. Wî çawa berhemên berê yên edebîyata klasîk a kurmancî, li ber nusxeyên wan ên berê îstînsax kirine, wî “berhemên nû” jî di vê biwarê da telîf kirine. Bi ser van da jî wî berhemên edebî, ji zimanên mîna farisî û tirkî wergêrane kurmancî.

Herçiqaq li gor Dostî (2010) Ehmedê Xanî (1650-1706) bi berhema xwe ya *Nûbihara Piçûkan* bi awayê mescû' berî Mehmûdê Bazîdîyî dest bi pexşana kurmancî kiribe (Dost, 2010, r. 20) jî, ev agahdarî ne rast e û dîsa bavê pexşana kurmancî her Bazîdî ye.

Bazîdîyî, *Mem û Zîna* Xanîyî, *Yûsuf û Zuleyxaya* Selîmê Silêmanî, *Leyla û Mecnûna* Harisê Bidlîsîyî, berhemên bi navê *Şêxê Sen'an* û *Berîsîsê 'Abid* ên Feqîyê Teyranî bi awayê pexşanî nivîsîne (Bazîdî, r. 22).

Mehmûdê Bazîdî di biwarê edebîyata devkî ya gel da jî xebitîye. Wî çawa ku *Kela Dimdim* û hikayeya bi navê *Sîyamend û Şemsê* jî derbasî nivîsê kirine, kilam, bêrîte û gotinên pêşîyan jî berhev kirine (Celalî, hb. r. 10). Xebata wî ya bi navê *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan* û *Durru'l-Mecalis* wekî du xebatên edebîyata gelî dihên hesibandin.

Di warê wergêranê da jî keda wî zêde ye. Wî *Gulistana Se'dîyê Şîrazîyî* jî zimanê farisî wergêraye kurmancî (Bazîdî, r. 22).

1.3. Xebatên Mela Mehmûdî

Giring e ku bihê dîyarkirin ku ji xeynî van çîrokan gelek berhemên din hene ku ji alî Mela Mehmûdî ve ji bo Aleksandre Jabayî hatine nivîsîn û îstînsaxkirin. Wekî *Adat û Rusûmatnemayê Ekradîye, Camîeya Hikayetên Kurdî* ku ji alî xwendekar û nivîskarên kurd ve bi awayekî baş dihên naskirin, ferhenga tirkî-kurdî, gramer û rêzimana kurdî (kurmancî)⁴ çendek ji van xebatan in. Ji van xebatan dîyar dibe ku Mela Mehmûd bi taybetî karê berhevkarîya folklor û edebîyata gelêrî ji Jabayî ra kirîye. Digel van xebatan, Bazîdîyî ji Aleksandre Jabayî ra destana "*Leyla û Mecnûn*"ê ji tirkî (dosyeya 31an) û *Şerefname* ji farisî (dosyeya 37an) wergêraye kurdîya kurmancî. Di heman arşivê da şeş dosye⁵ stran û lawje hene, lê Aleksandre Jabayî ew wekî berhemên "anonîm" qeyd kirine. Li gor ku Mela Mehmûd ji Jabayî ra karê berhevkarîyê kirîye, meriv dikare bibêje ku ev berhem jî ji alî Mela Mehmûdî ve hatine nivîsîn. Ger meriv wan jî wekî xebatên Mela Mehmûdî hesab bike wî çaxî derdikeve holê ku nêzîkî nivê arşîva Jabayî, ji aliyê Bazîdîyî ve hatiye nivîsîn. Giring e ku bihê dîyarkirin ku ji xeynî van hikayetan Mela Mehmûd çil çîrok û hikayetên din nivîsîne ku Aleksandre Jabayî ew wergêrane fransîzî û li gel destxeta kurdî ya bi tîpên erebî di sala 1860an da weşandine.⁶ Di pêşgotina berhemê da hatiye gotin ku bi arîkarîya Mela Mehmûdî ev çîrok ji bo çapkirinê hatine amadekirin.

4 Dosyeyên arşivê yê 8, 8a, 8b, 8c ferhenga kurdî tirkî û dosyayên 46 û 50 jî rêziman û gramer in.

5 Dosyeyên arşivê ji 1ê heta 5ê 3 û ya 49an

6 Alexandre Jaba (1860) *Receuil de notices et récits kourdes*, Académie Imperiale des Sciences, St. Pétersbourg. Ev berhem di sala 2010an da bi amadekarîya Zîya Avcî ji alî weşanxaneyê Lîs ve bi navê Camîeya Rîsaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî hatiye çapkirin.

Têkiliya Bazîdiyî digel rêzimana kurmançî jî bala merivan dikêşe. Wî çawa ku *Tesrîfa Kurmançî* ya Teremaxî û *Rahênanên Zimanê Kurdî* ya Mela Mistefa îstînsax kirîye (Bûlbûl & Öztürk, 2020, 117) û li serê gotar nivîsiye, bi ser da jî hin berhemên zanistî li ser rêzimana kurmançî nivîsîne. *Tuhfetu'l-Xîlan fî Zimanê Kurdan* û *Kêşana Karên Kurdî*. Wî di berhema xwe ya *Tuhfetu'l-Xîlan fî Zimanê Kurdan* da pîranîya mijarên rêzimanîya kurmançî li ser sekîniye û bi berhema xwe ya *Kêşana Karên Kurdî* bi giştî li ser morfolojîya lêkeran kûr bûye.

2. Durr'I-Mecalis

2.1. Destxeta Hikayetên ku ji Farisî Wergêrayî

Ev hikayetên Bazîdiyî di arşîva Aleksandre Jabayî (1803-1894) da bi sernavê *Durru'l-Mecalis* (bi fransîzî *Perle des Séances*) cih girtine. Bi tevahî 84 çîrok in û bi awayekî dubarekirî di du dosyayên cuda da (42 û 43). Di berga destxeta 43an da Aleksandre Jabayî bi fransîzî weha nivîsiye: “84 contes persans traduits en kurde par Mella Mahmud Bazidi, Traduction française avec les textes persans et turcs en regard par Auguste Jaba”. (84 Çîrokên farisî, wergêranên wan ên kurdî ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdiyî ve, Wergêrana fransîzî li gel metinên farisî û tirkî ji aliyê Auguste Jabayî ve) Di koleksiyona Jabayî ya Destnivîsên Kurdî 42 û 43yan da bi navê *Wergêrana Hikayetên Farisî* hatiye qeydkirin. Destxeta 42yan ji 62 wereqan pêk hatiye; destxeta 43yan 102 wereq e. Ebada destnivîsa 42yan 35x25 cm ye; ya destnivîsa 43yan 23x33 cm ye. Her du jî bi alfabeya erebî, xeta ruq'e ne. Di çend rûpelên ewil ên destxeta 42yan da latînzekirin û wergêrana wan a fransîzî jî heye. Di her rûpelekî da 13 xêz hene; bes 11-12 rêz hatine nivîsîn. Her du destxet jî bi hikayeya ku destpêka wê “Du jin derheqê zaroyekî de‘we dikirin û şahid jî tune ye. Her du çûne nik qazî û hakim. Ji qazî xwastin. Qazî celad gazî kir û emir kir ku vî zarûyî du parçe bike û bide herdu jinan.” dest pê dikin û bi hikayeya ku dawîya wê “Kurê feqîrî ev bihîst û got ku: “Sus bi hata babê te jî, ji binê vî kevirê giran rabe û xu bibîne, babê min jî digîje bihiştê.” diqedin. Naveroka van her du destxetan yek e. Di destnivîsa 42yan da wergêrana fransîzî û latînikirina wergêrana kurmançî, tenê di çend rûpelên ewil da heye; bes destnivîsa 43yan ji vî aliyê ve jê birêkûpêktir e. Metinê her hikayeteka eslî bi farisî jî, di heman rûpelan da li kêleka metinên kurmançî heye.

2.2. Navê Hikayeyan

Çîrok bê nav in. Di şûna navan da hejmar hatine nivîsîn. Mînak bi kurdî û farisî “hikayeta ibtîda” hatîye nivîsîn. Wergêrana fransîzî jî bi heman şeweyî ye. Çîrok ji aliyê Mela Mahmûdê Bazîdîyî ve ji bo Aleksandre Jabayî hatine nivîsîn. Çîrok ne li gor naverok /temayê / mijarê û ne li gor qewareya wan hatine dabeşkirin û ne jî hatine rêzkirin. Ji alî van her du taybetîyan ve jî hikayet bi awayê tevlihev hatine rêzkirin. Her rûpelek ji çar sitûnan pêk hatîye. Li milê çepê metinê farisî, li kêleka wê wergêrana wê ya fransîzî heye; di stûna din da jî kurmançîya bi alfabeya erebî û kurmançîya bi alfabeya latînî heye. Jabayî li ser rûpelê pêşî bi fransîzî weha nivîsiye: *84 Contes persants traduits en kurde par Mella Mahmoud Bazîdî Traducations française avec les textes persants et turc en regard par Auguste Jaba. Consul da Russie en retraite Smyrne 1868* (84 Çîrokên farisî, wergêranên wan ên kurdî ji aliyê Mela Mehmûdê Bazîdîyî ve Wergêrana fransîzî li gel metinên farisî û tirkî ji aliyê Auguste Jabayî ve. Balyozê rûsî malnişî İzmir 1868).

2.3. Cureyê Edebî yê Hikayeyên Durru'l-Mecalisê

Çîrokên gelêrî ku Mela Mahmûdî bi kurmançî nivîsîne, tevî metinên wan ên farisî û tirkî ku Aleksandre Jabayî lê zêde kirine û di nav destxetê da cih digirin, ji xeynî vê îbareyê ku wekî sernavê berhemê di wereqa yekem da hatîye nivîsîn, li tu cihê din ê nusxeya 43an navek yan sernavek ji wan ra nehatîye destnîşankirin. Çîrok bi farisî, bi kurmançîya tîpên erebî (ligel transkrîpa wan a bi kurmançîya tîpên latînî) û wergêrana wan a bi fransîzî hatîye nivîsîn. Nivîsîna bi tîpên erebî (farisî û kurdî) ji aliyê Bazîdî ve, transkriba wan a kurmançîya bi tîpên latînî û fransîzî, ji aliyê Jabayî ve hatine kirin. Li gor qenaeta me, cureyê hin ji van hikayetan pêkenok in. Di hinan da dîyalog hene ku di navbera mirov û lawiran da derbas dibin. Fabl jî di nav wan da hene (hikayeta 41ê). Lê naverok, yan jî mijar çi be, di dawîyê da pend ango dersderxistin heye. Hikayet ne dirêj in, herî zêde du yan sê paragraf in. Hinek ji wan pir kurt in, çar yan pênc, heta du hevok in.⁷ Lê di dawîya her hikayetê da dersek heye ku mirov hişyar dike da ku bêdaletîyê neke, yan nebe hevalê bêdaletî û xerabbûnê; lêbelê bibe hevalê qencîyê. Hinek hikayetên wê hene ku dirûvê serpehatîyan jî dide wan.

7 Mînak hikayeta bîst, sih û yekê, sih û duyê, çil û sêyê, çil û pêncê, pêncî û sêyê û heftê û nehê ji du hevokan pêk dihên.

Taybetmendîyeka din a van hikayetan ew e ku sernavê wan tune ye; ji alî nivîskarî ve hatine hejmarkirin û wî bi zimanê erebî bi giştî ji wan ra gotîye *Durru'l-Mecalis*. Li gor agahîya ku Aleksandre Jabayî li ser bergê nivîsîye ev hikayetên farisî ne ku li Îranê bi vî navî dihên naskirin. Rast e ku li Îranê rêzeçîrokên bi vî navî hatine nivîsîn hene; lê ji devê kê hatine wergirtin yan kê ew nivîsîne ne dîyar e, ango çîrok anonîm in. Êdî haya Mela Mehmûdî ji van çîrokên anonîm çawa çê bûye, ne dîyar e. Gelo nusxeyeka wan a bi farisî ketîye destê Melayî û wî ev nusxe tenê wergêraye kurdî, yan li gor ku wî ji devê derdora xwe bihîstîye û bi qasî ku di bîra wî da maye nivîsîye, ne dîyar e.

Çawa ku Zîya Avcî (2010) jî amaje pê dike, Mela Mehmûd ew hikayetên xwe yê bi navê *Camie 'ya Risaleyan û Hikayetan bi Zimanê Kurmancî*, ji nav xelkê wergirtine, berhev kirine û derbasî nivîsê kirine (Bazîdî, r. 8). Ji ber vê sedemê ye ku folklornasên mîna Pertev û Aslan (2013) ew wekî “pêşengê folklorê kurdan” (Yıldırım, Aslan, & Pertev, 2013, r. 54) destnîşan kirîye. Jixwe Bazîdî bi xwe li bajarên mîna Mûş, Bidlîs, Erzîrom, Qers, Wan û Erzincanê gerîyaye û hikayeyên *Cami 'eya Risaleyan û Hikayetan* jî ji nav gel berhev kirine û derbasî nivîsê kirine. (Bazîdî, r. 22).

254 | Li gor vê rewşê qenaetek bi merivan ra çê dibe ku hemû çîrokên *Durru'l-Mecalisê* ne ew hikaye ne ku kit û mit ji zimanê farisî bi bal kurmancî ve hatine wergêran; belkî hinek jê wisa bin; bes bi giştî ji nav gel jî hatine wergêran (Xoşnaw, 2019, r. 6). Çi heye ku gava meriv bala xwe dide ser sentaksa van hikayetan dibîne, karîgerîya risteyên farisî li ser binyad û teşeyê risteyên wan heye. Wisa qenaet bi merivan ra çê dibe ku Mela Mehmûd serê ewil metina farisî nivîsîye, piştra ew wergêraye kurmancî.

2.4. Hikayeyên *Durru'l-Mecalisê* di Navbera Wergêran û Berhevkarîyê da

Li gor agahîya ku Aleksandre Jabayî li ser bergê nivîsîye ev hikayetên farisî ne ku li Îranê bi vî navî dihêne naskirin. Rast e, wekî me li jor amaje pê kir, li Îranê rêzeçîrokên bi vî navî hatine nivîsîn hene; lêbelê ji devê kê hatine wergirtin yan kê ew nivîsîne ne dîyar e, ango çîrok anonîm in. Hemin Omar Ahmed ku li ser derstnivîsên arşîva Jabayî xebitîye dibêje ku hikayeta yekem, di “Hedîs”an da jî derbas dibe û yê din jî ji hikayetên liberdest ên *Durru'l-Mecalisê* pir cîyawaztir in.⁸ Herweha varyanteka hikayeta yazdehê li herêma Mêrdînê di nav gel da dihê gotin (Aslan, 2019, r. 73). Hikayeta şazdehê ya derbarê masîgirê ku masîyek dîyarî

8 Agahiyên ku bi rîya telefonê Omer Ahmed bi me ra parvekirin. 20.10.2020

xundkar dike, hikayeta pêncî û şeşê ya derbarê “mirovên serpiçûk û rihdirêj ehmeq in” û hikayeta şeşt û sêyê ya derbarê mela û mirovê nandar⁹ da jî, di nav civakê da berbelav in. Eger weha be, mirov dikare bigihîje wê qenaetê, qet nebe Mela Mehmûdê Bazîdiyî hin ji van hikayetan di dema şagirtîya xwe ya medreseyê da ji devê seydayên xwe bihîstine û li gor ku di bîra wî da mane ew ji bo Aleksandre Jabayî nivîsîne. Ev qenaet berê meriv dide pîrsa derbarê teşeyê pêşî yê çîrokê, ango varyanta esasî ku cara yekem hatîye hilberandin.

Ji bo bersivdana vê pîrsê zanyaran serî li gelek teorîyan daye û varyantên heman çîrokê analîz kirine da ku varyanta esasî derxin holê. “Teorîya binyadgerî” û “teorîya dîrokî û erdnîgarî ya finî” du teorîyên sereke ne ku wan hewil daye teşeyê pêşî yê vegotinên gelêrî derxin holê. Li gor Richard Dorsonî gelek rêyên lêgerîna binyad û belavbûna çîrokan hene û yek ji van, metoda finî ye. Li gor vê metodê, çîrokek ku bi sedan varyantên cuda dihê vegotin, bivê nevê nîşan dide ku ew di demeka berê da, li devereka dîyar hatîye hilberandin. Piştra ev teşeyê pêşî ku cara ewil hatîye hûnandin, çawa gava meriv kevîrekî bavêje nav avê, tê da pêlan çê dike, ev berhem jî bi rêyên wekî bazirganî û koçê, li deverên din belav dibe (Dorson, 1963, r. 94). Li cîhanê gelek çîrok hene ku bi sedan varyantên wan ên cihê li herêmên dûrî hev û di nav gelên cuda da peyda dibin. Ji van, mînakê herî naskirî “*Çîrokên Keça Qenc û ya Xerab*” e. Yek ji pêşengê teorîya dîrokî ya finî Roberts Warrenî di salên 1950î da zêdeyî 900 varyantên vê çîrokê berhev kirine û bi vî sernavî wekî pirtûk çap kirîye. Di xebata navborî da Roberts ji teşeyê pêşî yê çîrokê zêdetir balê dikêşe ser formên herî karîger ku li herêmeka taybet hatine berhevkirin. Bi vî awayî Roberts îdia dike ku *Çîrokên Keça Qenc û ya Xerab* berî sedsala 19em li Rojhilata Nêzîk derketîye û ji wir bi rêya Deryareş û Derya Xezarê derbasî Ewrûpaya Bakur bûye. Lê Dorson dibêje ku Roberts qet tu nirxandinekê nake ka çawa ev çîrok gihîştîye Hîndistan û Japonyayê. Herweha Dorson radigihîne ku formeka nû ya vê çîrokê berî sedsala 16em dest pê dike, ji Rojhilata Nêzîk belav dibe û varyanteka wê li Tirkîye jî derdikeve. Herçiqas Dorson (r. 94-5) balê dikêşe ser kêmasiyên metoda Roberts jî, qebûl dike ku ev metod destnîşan dike bê çawa çîrokeka gelerî ya ewqas aloz digel guhertin û belavbûnê li erdnîgarîya Hind û Ewrûpayê nasnameya xwe, ango teşeyê xwe yê pêşî parastîye.

9 Ev hikayet, ne tenê di nav kurdan da, lê di nav tirkan da jî berbelav e. Bi navê “Ye Kürküm Ye”yê hatîye çapkirin.

Di heman salan da Stith Thompsonî jî xwestîye metoda finî biceribîne û ji bo vêna 86 varyantên “Çîroka Mêrê Stêr”ê ji nav çil eşîrên niştecihên Emerîkaya Bakur berhev dike. Piştî berawirdkirina wan, Thompson digihîje wê encamê ku teşeyê pêşî yê vê çîrokê berîya sedsala 19em li deştên navendî yên Emerîkaya Bakur derketîye û piştra ji nav eşîrekê derbasî nav a din bûye. Ev xebata Thompsonî jî wekî ya Robertsî dîyar dike ku teşeyê pêşî yê “Çîroka Mêrê Stêr”ê wekî pêlên ku kevîr gava dikeve nav avê çê dike, di nav eşîrên niştecihên Emerîkaya Bakur da belav bûye (Dorson hb. r. 95).

Mimkun e ku varyantên hikayeta derbareyê “Tîmûrê Moxol”ê da (hikayeta 22yan) û ya derbareyê Îskenderî (hikayeta 36yan), wekî mînakên di van her du xebatan da, pêl bi pêl di nav gelên îranî ecem û kurd û piştra tirk da belav bûbe û Bazîdîyî varyanteka van çîrokan ji devê kesên derdora xwe bihistibe. Çawa ku dihê zanîn di nav civaka kurd da gelek hikayet derbarê Tîmûr û Îskenderî da dihên gotin. Hikayeta pir kurt a 38an jî destnîşan dike ku ev hikayet anonîm in û li her herêmekê bi şeweyekî dihêne gotin. Dişa hikayeta kurt a heftê û çaran (74) a derbareyê Eflatûnî da nîşaneyê karaktera anonîm a van hikayetan e. Belkî ji van tevan jî giringtir hikayeta heftê û pêncê (75) ya derbarê xundkar û wezîrê wî da ye. Hem wekî pileya desthilatdarîyê û hem wekî tégîh peyva wezîrî di gelek çîrokên kurdî da derbas dibe. Ji ber vê meriv dikare îdîa bike ku wekî hikayetên derbarê Tîmûr û Îskenderî da vê hikayeta navborî, Mela Mahmûdî ji devê kesên derdora xwe bihistîye û ne ji metineka nivîskî wergêraye. Di berhema Bazîdîyî da gelek çîrokên din jî hene ku xwedî heman karakterên anonîm in.

Wekî mînak Bazîdîyî cih daye hikayeteka (hikayeta 76ê) derbareyê Siltan Mahmûdê Xeznewî û xizmetkarê wî Eyaz. Çi balkêş e ku Mewlana heman hikayet di *Mesnewîya* xwe da nivîsîye (Rûmî, 2015, r. 159).¹⁰ Dema meriv her du varyantan dide ber hev, bi awayekî eşkere xuya dike ku Mela Mehmûd ev hikayet ne ji metineka nivîskî wergêraye; berovajîyê wê, wî wekî hemû berhemên devkî ji kesekî ev hikayet guhdarî kirîye û bi qasî ku di bîra wî da maye derbasî nivîsê kirîye.

Giring e amaje bihê kirin ku di vê mijarê da Bazîdî ne tenê ye. Hem Mela Mûsayê Hekarî û hem Mewlanayî bi heman şeweyî çîrokên gelêrî nivîsîne. Wekî mînak çîroka “*Totî*”yê ku Mewlana bi helbestî nivîsîye (cild I rr. 120-131; 141-

10 Di wergêrana kurdî ya *Mesnewîyê* da (cildê 5an, r. 159-164; 175-183) navê vê hikayetê “*Dastana Eyaz*” e. Bin. Mewlana Celâleddin Rûmî (2015), *Mesnewî*, (Wer. Mela Ahmedê Şerefxani), Weşanên Çandî ya Şaredariya Konyayê: 256.

143), di *Durru'l-Mecalis* Mela Mûsayê Hekarîyî da jî cih girtîye. Herweha çîroka du varyantên cuda yên “*Tinêkirina Baxvanî Sofî, Mela û Seyîdî*”yê ku Mewlana nivîsîye (cild II r. 173) hene. Yek li herêma Mêrdîn-Nisêbînê dihê gotin,¹¹ ya din di berhema Celîlê Celîlî ya bi navê “*Çima Deve Xeyîdî*”yê bi navê da cih girtîye (Celîl, 2016, r. 11). Tevî vê, di hejmara 18an a kovara *Hawarê* da çîrokeka bi navê “*Şêr û Gayê Zer*”ê (Botî, 1940, r. 8) ku di dirûvê vê da ye heye. Dîsa di *Mesnewîya* Mewlana da hikayeta bi navê “Qiseya wî yê teyrikgirtî ku wesiyet kir ku serbihûrîya peşîmanîyê nexwe”yê heye (cild IV r. 186). Varyantek vê hikayetê jî li herêma Mêrdîn-Nisêbînê dihê gotin. Ji xeynî van mînakên du pêkenok jî di *Mesnewîya* Mewlana da hene ku bi varyantên cuda di nav gel da dihêne gotin. Di cilda Vem da çîroka “kesê ku revîyaye ji ber ku keran digirin ku bar li wan kin” (r. 219) û ya “derwêşê ku li xulamê xemilandî yê Emîdê Xurasanî rast hatîye û gotîye ‘ey Xuda xulamperwerkirinê ji Emîdê Xurasanî fêr be’” (r. 292) heye. Varyantek çîroka derbarê barkirina kerê da li herêma Mêrdîn-Nisêbînê dihê vegotin. Di vê varyantê da heywana ku bihê barkirin deve ye û yê ku ji tîrsa direve rovî ye. Lê mijar û pend heman in. Varyanteka hikayeta “derwêş”î bi tirkî dihête gotin û kesê ku ji Xweda jî gazin kirîye, wekî merevekî beктаşî dihê binavkirin.

Ji van mînakên tev da, dîyar dibe ku hikayetên di berhema Mela Mehmûdê Bazîdîyî da anonîm û hevpar in di nava çandên kurd, faris, tirk û ereb da. Bê guman ji bo meriv vê yekê teqez pesend bike pêwîst e hemû varyantên van çîrokan bihêne berhevkirin û wan berawird bike, da ku teşeyê wan ê pêşî û cihê ku lê derketîye tesbît bike. Lê ev karekî ku meriv nikare di çarçoveya gotarekê da pêk bîne. Li vir em tenê dixwazin bi bîr bixin ku çîrokên ku Mela Mehmûd nivîsîne, wekî hemû çîrokan xwedî karaktera anonîm in ku meriv nikare wan wekî hikayetên îranî bi nav bike.

2.5. Mîjara Hikayeyên *Durru'l-Mecalisê*

Mijar ango naveroka hikayetan bi gelemperî nakokîyên di navbera mirovan da ne. Ev nakokî carinan di navbera du jinan da, carinan di navbera jinek û mêrekî da û carinan jî di navbera du meran da diqewimin. Di van nakokîyan da alîyek rûbirû xerabîya alîyê din dibe. Ji bo çareserkirina van nakokîyan û pêşgirtina xerabîyan mirov hertim diçine nik xundkar anku desthelatdarî. Xundkar her car

11 Di vê varyantê da sê kes (yekî cihû, yekî suryanî (fileh) û yekî misilman) dikevin rezê yekî misilman.

wekî desthelatdarekî dadmend û xwedî merhemet hatiye pêşkêşkirin; bi dademendî û biryara xwe rê li ber xerabîyan digire. Bi gotineka din, xundkarê di van hikayetan da ku hemmaneyê padişah, mîr, walî, qazî, hwd ye, temsîla desthilatdarîyê dike. Dema li devera ku ew desthilatdar e, kirinên xerab hatine kirin, kesê ku bûye hedefa xerabîyê doza xwe birîye cem û jê daxwaza bicihanîna edaletê kirîye. Herçiqas bi piranî xundkar wekî mafparêzê kesan hatibe pêşkêşkirin jî di hin hikayetan da wekî kesekî ku bi awayê bêedalet tevgerîyaye hatiye destnîşankirin. Hikayeta hijdeh û bîst û çarê, du mînakên wisa ne ku bêedaletîya xundkar destnîşan dikin. Lê di van herdu hikayetan da jî dîsa adîlbûna wî dihê parastin û dihê destnîşankirin ku xundkar ne bi zanebûn weha dike û dema dihê hişyarkirin, ji kirina xwe poşman dibe û lêborîna xwe dixwaze. Heta di hikayeta hivdehan (17) da xundkar wekî kesekî nezan ku bi hesanî dihê xapandin hatiye danasîn.

Di hin hikayetan da xundkarî bi destê xwe dadmendî kirîye, çawa ku di hikayeta pêncê (5) da derbas dibe. Di vê hikayetê da mirovek diçe gel xundkar û dibêje, “Şevî dinê, merifek ji leşkerê xundkar cibrî hate mala min û digel carîya min zina kir.” Li ser vê xundkar diçe mala xwedîyê mirovî û kesê bi zorê ketîye mala wî dikuje. Paşê xundkar ji xwedîyê malê ra dibêje eger ew kes lawê wî jî bûya ji bo edalet bihê cih, wê ew bikuşt. Di vir da nîşaneyê pîvana edaletê xuya dike. Wekî xundkar parêzê rastîyê û edaletê ye, kesê ku li dijî rastî û edaletê derkeve, lawê wî jî be, pêwîst e bi dadmendî li dijberî wî derkeve û wî ceza bike.

Temayên wekî nezani, şahrezayî, fenbazî, dilsozî, comerdî, arîkarîkirina kesên xizan mijara hikayetan e. Ji teswîrê zêdetir hikayet li ser diyalogan ava bûne. Bi piranî diyalog di navbera xundkar¹² û kesên ku rastî xerabîyê /tundîyê hatine û ji bo gilîkirinê çûne cem xundkarî derbas dibe. Xwedîyê gilî ji xundkarî dixwaze ku li hember bêheqîyê/neheqîyê mafê wî biparêze. Xundkar jî di encamê da vêya diîne cih.

Di piranîya hikayeyên vê berhemê da rûdan li derdora “xunkar” û “qazî”yî diqewimin. Lewra heq heye ku em li vir cihekî xusûsî bidin pênase û ravekirina van her du têgihan. Bêjeya “xunkar” li gor ferhenga farisî (خوننگار) dihê maneya “xudanserwer” û bi awayê “xundgar”î (Gulî, 2002, r. 173) hatiye qeydkirin. Di ferhengêka din a farisî da bêjeya “xunkar” bi awayê (خداوندگار) “xudawendigar” ango “sahib, malik û serwer” (‘Emîd, 1389, r. 500) hatiye nivîsîn. Ev bêje bi awayê “hünkâr” wekî têgiheka sîyasetê ketîye çanda rêveberîya dewletî ya tirkî. Li gor

12 Di hikayeta 48ê û 50yê da desthilatdar ne xundkar lê wek qutwal hatiye binavkirin.

fehenga kurmancî “xundkar” dihe maneya “hukumdar” û “key” (Îzolî, 2013, r. 644). Ev bêjeya “xunkar” bêtir di sîyasetmedarîya tirkî da cih digire; bes di çanda sîyaset û rêveberîya kurdan da di çî dereceyê da hatîye bikaranîn, cihê mereqê ye.

Bêjeya “qazî” bi zimanê erebî ye û li gor ferhenga erebî (القاضى) ji wan kesan ra dihe gotin ku li dozên xisûmetê dinihêrin û li gor şer‘ê, yan qanûnan hukman derdixin (Huseyn, 2013, r. 274). Bêjeya qazî bi awayê “kadî” ketîye ziman û çanda tirkî; bi awayê “qadî” (Farqînî, 2000, r. 630) û “qazî” ketîye ziman û çanda kurdî (kurmancî) û li pêşberî vê bêjeyê, bêjeya “hakim” hatîye danîn (Îzolî, hb. r. 456). Di ferhenga zimanê farisî da “qazî” (قاضى) bi wateya “hakimê şer‘ê” û “dadres” hatîye qeydkirin. Bi ser vê têgihê da bêjeya “qadîyulqudat” jî di farisî da heye ku wekî “reîs û serdarê qazîyan” hatîye dîyarkirin (‘Emîd, hb. r. 808).

Carinan bêjeya “qazî” wekî navekî unwanî di çanda kurdan da cih girtîye. Çunkî em dibînin ku navê serokkomarê Komara Kurdistanê jî Qazî Mihemed e (Veroj, 2007, r. 1). Ji ber ku piranîya dozên edlî yên civaka kurdan bi awayê devkî, li ser milê Mela û Muderisên medreseyên Mîran bûn, qazîyên wan ên fermî tune bûn. Lewra bêjeya “qazî” tenê ji bo wezîfedarên fermî yên dewletê hatîye bikaranîn.

Encam

Wekî encam meriv dikare dîyar bike ku herçiqaş ji aliyê qewareya xwe ve hikayetên *Durru'l-Mecalisê* kurt in û ne li gor naveroka mijarê hatine nivîsîn û dabeşkirin jî, ev 84 hikayet mînakên balkêş in û destnîşan dikin bê ka çawa berhemên devkî di dirêjahîya dîrokê da, bi form û varyantên curbicur di nav gel û civakên cihê da belav dibin û hebûna xwe bi awayên curbicur diparêzin. Ji van berhemên devkî jî bi taybetî kurteçîrok yan hikayet bi form û varyantên cuda di nav civakên curbicur da bêne vegotin jî ew hertim heman peyamê ango pendê radigihînin merivahîyê. Kurte hikayetên *Durru'l-Mecalis* vêya pesend dikin.

Çavkanî

- Aslan, M. (2019). *Baqek ji Folklorê Berîya Mêrdînê*. Diyarbakir: Wardoz.
- Bazîdî, M. M. (2010). *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan bi Zîmanê Kurmancî* (Amadekar: Ziya Avcî). Diyarbakir: Lîs.
- Bilbil, M., & Oztürk, M. (2019). *Rêzimana Mela Mehmûdê Bazîdîyî: Tuhfetu'l-Xillan fî Zîmanê Kurdan*. Diyarbakir: Weqfa Mezoptamyayê.
- Botî, M. E. (1940). Şêr û Gayê Zer. *Hawar*, 8.
- Bûlbûl, M. & Öztürk, M. (2020). Destnivîska Mela Mistefa ya Rahênanên Zîmanê Kurdî (Nirxandin, Metin). *Folklor û Zîman*, 117-140.
- Celalî, M. (2016). Mela Mehmûdê Bazîdî. *Kürt Tarihi*, 27.
- Celîl, C. (2018). *Çîma Deve Xeyidî?* Diyarbakir: Wardoz.
- D. Îzolî, (2013). *Ferheng: Kurdî-Tirkî; Tirkî-Kurdî*, (Amadekar: Kamer Beysulen). Diyarbakir: Weşanên Deng.
- Dorson R. M. (1963). Current Folklore Theories, *Current Anthropology*, 4(1) 93-112.
- 260 | Dost, J. (2010). *Mela Mehmûdê Bayezîdî, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*. İstanbul: Nûbihar.
- 'Emîd, H. (1389). *Ferhengê Farisî 'Emîd, (Wirastar: 'Ezîzullah 'Elizade)*. Kitabsînasê Millî.
- Farqînî, Z. (2000). *Türkçe-Kürtçe Sözlük*. İstanbul: İstanbul Kürt Enstitüsü.
- Gulî, M. X. (2002). *Ferhenga Gulî (Farisî-Kurdî)*. Hewlêr: Wezaretê Perwerdê.
- Huseyn, E. R. (2013). *Mu'cemu'n-Nefaisî'l-Esasî, (Îşraf: Ehmed Ratib 'Irmuş)*. Beyrut: Darunnefais.
- Öztürk, M. (2017). *Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî*. Diyarbakir: Lîs.
- Rûmî, M. C. (2015). *Mesnewî* (Wer. Mela Ahmedê Şerefxanî). Konya: Weşanên Çandî ya Şaredarîya Konyayê.
- Veroj, S. (2007). *Dadgehîkirina Serokkomar Qazî Mihemed*. Diyarbakir: Bîr.
- Xoşnaw, H. (2019). *Durru'l-Mecalis: Yekemîn Komele Çîrok le Mêjûy Pexşanî Kurdî- Wergêran da*. Hewlêr: Çapxaney Hêvî.
- Yildirim, K., Aslan, M., & Pertev, R. (2013). *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*. Mardin: Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları.

PÊVEK I : Xebatên ku di wan da behsa jîyana Mela Mehmûdî hatiye kirin

Avci, Z. (2010), Pêşgotin ji bo Adat û Rusûmatnameê Ekradîye ya Mela Mehmûdê Bayezîdî

Çelîk M. (2015), '*Adat û Rusûmatname'ê Tewayîfê Ekradîyeya Mela Mehmûdê Bazîdî (Metn û Lêkolîn)*', Teza Lîsansa Bilind ya Neçapbûyî, Zanîngeha Mardin Artuklu.

Dost, J. (2012) *Adat û Rusûmatnameê Ekradîye Mela Mehmûdê Bayezîdî* (çapa 2em), Îstanbul: Nûbihar.

Gültekin, M. (2014), Di arşîvên rojava û osmanî de derheqê Mela Mehmûdê Bazîdî de agahîyên nû, *Nûbihar*, j. 129.

Gültekin, M. (2015a). Di arşîva Prof. Ferdînan Justî de nameyên Aleksandre Jaba, *Fritillaria Kurdica*, 9, 129-132.

Gültekin, M. (2015b), Di arşîva Osmanî de Mela Mehmûd Bazîdî", *Nûbihar*, 130, Stenbol

Kurdo Q. & Mûsaêlîyan C. J. Pêşgotin ji bo Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî

Ozturk M. (2017), Koleksiyona Aleksandre Jaba ya Destnivîsên Kurdî (Vekolîn û Saloxdan) Dîyarbakir: Lîs.

Paradowska, M. (1971/2016). Lêkolînek li ser destxeteka Mela Mehmûd Bayezîdî, (Trans. by S.Hîrorî), <http://www.kulturname.com/?p=10321>

Rûdenko M. R. (1963) Pêşgotin ji bo çapa rûsî ya Adat û Rusûmetnameê Ekradîye

Vasilyeva Y. Mela Mehmûdê Bayezîdî (wergêran û lêzêdekirin Têmûrê Xelîl)

Vasilyeva Y., Pêşgotin ji bo tercûmeya Mela Mehmûdê Bayezîdî ya Şerefnameya Şerefxanê Bidlîsî

PÊVEK II : Wekî nimûne, metina du çîrokan

Hîkayeta Yekê

Du jin derheqê zaroyekî dawê dikirin û şahid jî tune. Her du çûne nik qazî û hakim. Ji qazî xwastin. Qazî celad gazî kir û emir kir ku vî zarûyî du parçe bike û bide herdu jinan. Jinek ku ev xebra bihîst bê deng ma; jina din dest bi gazî û zarîn kir ku di riya Xudê zarûyê min parçe meke. Eger ‘adil wiha be ez zarûyî naxwazim. Qazî tehqîqetê kir ku diya zarûyî ev e. Zarû bi wê spard û jina diz ra qazî neda û qewirand.

Hîkayeta Heştê û Çarem

Kurê maldarekî min di ku li ser qebra babî rûniştîye û digel kurê feqîrekî mubahese dikir: “Dayima ku tabûta babê min bi qîmet e û nivîsara wî rengîn û kevirê mermer havêtinê û acûr ji pîrûzeyî çêkirin e. Bi qebra babê te ciwanî weşêrek û acûrekî der cemî kirine û mistekî du xulî li serê raxistine.”

Kurê feqîrî ev bihîst û got ku: “Sus bi hata babê te jî, ji binê vî kevirê giran rabe û xu bibîne, babê min jî digîje bihiştê.”

PÊVEK III : Nimûne ji wereqên berhemê

Bergê Pêşî



